Hosta Hovhannês

(*Kurteromana bûyerî-2*)

Wezîrê Eşo

Beriya peyda kirina hostên danîna dîwarên havîngeha me Şîraliyê, ku li Sipîtakê, nêzîkî gundê me dima bi giranî bi destî şofêrên wî bajarî û nasên xwe, pê avtomobîlên wan yên barkêş kevirên birî, taraqkirî û ji bona danînê amade ji Ertîkê, çêmênto, mesele û madeyên ji bona çêkirin û avakirina havîngehê pêwîst dabûn anînê û di zeviya me da rokirinê. Her bi tenê dima hosta bên û dest bi danîna dîwaran bikin. Lê me karê kifşkirin û vexwandina hosta weke karekî hêsan û ne acil hiştibû, paşda xistibû dawiya karên dinê, çimkî hosta ji gundê me bûn û wê salê jî, weke gelek salên dinê, hinek ji wana neçûbûn axa xam û xopan, gund da ji bona cîanîna hinek kar û barên mala xwe mabûn. Lê ji nişkê va, bê ku em li bendê bin, di vî warî da piroblêm çê bû, piroblêm jî ne ya hêsan, lê ya giran. Di warê kifşkirina hostan da em herçar bira-alîkî û bavê min-alîkî din da li hev rûneniştin, bi ser da jî em dijî nêrînên hev rawestiyan. Û, awa, bi çi awayî. Ezîzê birê min bi neferên xwe va hatibû zozana, havîngeha xwe ya nû da bi cî bibû. Bavê min û birê minî Şalîko ji Tivlîsê hatibûn gund bona bi cîanîna çêkirin, avakirina havîngeha min û Şalîko, lê ez–ji Yêrêvanê. Û ber ku Yêrêvan ji Tivlîsê nêzîktirî gundê me bû, çûyîn-hatina navbera wan da hêsantir bû-ez heftê carekê dihatim gund û carina eynî rojê da vedigeriyam Yêrêvanê, ku karê xwe yê weşanên Kurdî yên li radiyoyê bi cî bînim, ku herroj, bê navbirî weke weşanên li radiyoyê dihat bi cîanînê, berdewamkirinê.

Em hersê bira bi bavê xwe ra civiya bûn û hema wê rojê me bi hev ra tivdîra danîna dîwarên odên havîngeha me herdu biran didît, bê ku benda Şîralî bimînin, ku gotî wê rojê ji bona bi cîanîna eynî tivdîrê ji Sipîtakê bihata Pampê. Ezîzê birê min, ku haya wî ji helwesta bavê ya himberî peyîdakirin, kifşkirina hostên danîna dîwarên havîngehê tune bû, bi dilê xwe yê sax ji bavê min û ji me biran re got:

-Bavo, gelî bira, de niha bêjin, kanê hûnê ji hostên gundê me kîjanan û çend kesan vexwînin, ku dîwarê avayê we dayînin, îdî roj pê ra gihîştin, hemû tiştê ji bona danîna dîwaran jî û avakirina odan jî amadene. Ez êdî nizanim, bavê min mexsûs xwe, weke dibêjin, xamî avêt, şûna nezan û hayînedarekî danî yan mexsûs, bi merem ev pirsiyar ji Ezîz kir:

-Çima hostên danîna dîwara gundê me da jî hene?
-Çima haya te jê nîne, bavo, -Ezîz bersiva wî da, -lê kê dîwarên odên havîngeha min danîn? Hema hema hemû lawikên ji gundê me, yên xopançî, hostên danîna dîwaranin. -Na, birê bavê xwe, -bavê min ji Ezîz ra got, -dîwarê havîngeha lawên min gotî hostên eslî, pispor, yên ji Sipîtakê dayînin.

-Bavo, -Ezîz jê ra got, -em hostên pispor û ne pispor jî alîkî dayînin, lê tevî baştir ewe, ku hostên ji gundê me yên xopançî avayê me çêkin. Ez çima dibêjim:yên ji gundê me? -Ezîz weke xwe xwa ji xwe pirsiyar bike got, -ber ku hûn li gund namînin, tendûr-kuçkê we, pez û dewarê we li vir tunene, ku hostê dereke, ji derva bînin, û bikaribin wana bi nan û av bikin, cî û star bikin. Lê ya hostên cî, ji gundê me xêra xwedêye. Heq, kiriya wan bidê û axayîn, bê xemkêşî xwe bide alîkî. Malê wan gund danin, ne dew, daxwaza nan ji te dikin, ne jî ya avê, vexwarinê. Hûn zanin, wekî meriv vê hênê araq û şeraba hosta da ditefe. Axir ew jî hesabe.
-Karê te hesaba neketiye, -bavê min axaftina Ezîz kirt ber da birî. -Tu wan hesaba, wê mesrefê benda min bihêle. Şikir, perê min hene, lê ez kîjan rojê ra xebitîme?

-Bavo,-Ezîz dest ji pêsîra wî berneda, -te xwe ew pere li kûçê, ji erdê berev nekirine, ne axir te, weke dibêjin, xûna xwe bi qazanckirina wan ra xweriye, rêtiye. Şeherê Tivlîsê da qazanckirina pera tiştekî hêsa û qolayî nîne.

-Na, bavê min, -bavê min ser giliyê xwe da ket, -karê te wê yekê neketiye, ez kurê Welathûtîme, wekî min dest bida ber pera-niha ser-stûnê min giş zêr bûn. -Bavo, -Ezîz pêda ket, -em pera, nan û avakirinê, bi cîkirin û hewandinê jî alîkî dayînin. Lê ez fem nakim: Çima tu nexwazî lawikê me avayê we çêkin, çaxê pêşe, şuret û pisporiya wan ber çavane? Vaye, tamê min.

-Kanê pêşê wan, li Yrisetê?-Bavê min mexsûs ser avayê havîngeha Ezîz ra xarand, ew negirt ber hesêb.-Ez haj wê yekê jî heme: Lawikê gundê te li wir tewla û goma çê dikin û ser ûsilê dilpaqij û xêvikê dilê xwe va dikin, lê eva avaye, odên bi pencere yên mayîn û jiyana merivane.

-Lê ev avayê min çiye, xwe avayê min jî gom yanê tewle nîne, ne axir ew jî odên bi pencere yên tê da mayîna merivane, çi qusûra wan heye?-Ezîz xwest bavê min bi vê îzbatê bide bendkirinê, bîne rayê.

-La, lao, -bavê min bersiva wî da, -ewê avayê te çê kirine ewana zarê du na pêrin, xwe nagîhîjin hostên berê, ku çûktiya xwe da li ber destê hostên pispor çakûç dane destê xwe.

-Em hostatiyê jî li alîkî dayînin,-Ezîz dîsa pêsîra bavê xwe berneda,-lê ne axir ew him jî qewimê mene, gundiyên mene, merivatiya mene. Bera, hazir, xêra me, qazanca me bigîhîje wana, ew karêkevin.

-Xwedê min qurbana lawikake, -bavê min weke xwe cara got, çimkî bi rastî jî qedrê xort, zilaman zanibû, nemaze yên merivatiyê, lawên qewim û pismaman,-çima ez naxwazim keda

min bigîhîje wan? Cî bê, ez ronaya çavê xwe jî ji wana nahêvişînim, ew jî, bê mene, lê gune ewladên minin. Lê çi jî dixwazî bêje, ez îtibara xwe lawikên me weke meriv, weke lawên qewim û pismama tînim, lê weke hostên danîna dîwarên kurê min-nayînim. Eva avayê xelkê nîne, ez wî kurê xwe, nevî-nevîçirkên xwe ra ava dikim.

-Çima ez ne kurê teme?..Lê te çima hişt ez avayê xwe bi xopançiyên gundê me bidim çêkirinê?-Ezîz mexsûs bi awayê xeyîd û gazina gotê.

-Tu cihêyî, malxwê mala xwe, şikir, tuyî, -bavê min jê ra şîrove kir, -yekê jî, te kengê tivdîra xwe li min xist, ji min ra got û min jî riya rast neda ber te? Welle, ya min bûya, avayî, havîngeha te jî gotî hostê eslî, pispor çêkirana, yên weke Mampirê û Hovhannês, -dawiya dawiyê bavê min mexseda xwe eyan kir. -Bavo, -Şalîko vê carê jê ra got, -niha hestûyê Mampirê jî bin axê da rizîne, lê ya Hovhannês ez nizanim heye yan tuneye.

-Heye, -bavê min Şalîko ra got,-şikir heye, ez hay jê heme.

-Ê, hebe jî, -Şalîko gote bavê, -xwe niha jî dîwara danayîne, mêrê mezin -Sebira xwe bînin, -Ezîz got, -Şîralî wê hat, ew cînarê Hosta Hovhannês e, niha me baştir haj pê heye, kanê ew mêrê mezin hê dîwarên avaya datîne yanê na. Û bi temamî jî gotî Şîralî pirsa hostan safî bike.

*** * ***

Şîralî hat û vê carê ew û bavê min ketin pêsîra hev. Bavê min, ku eşkere baweriya xwe bi gotina Şalîko neanî, serê giliya vekir, kese, bê pêşgotin ji Şîralî pirsî:

-Şîralî, Hovhannês hê dîwara datîne?

-Bavo, -Şîraliyê, ku haya wî ji axaftina navbera bavê min, Ezîz û Şalîko da tune bû, bi vebeşirandineke bi awakî wisa, weke bêje: "Tu çi pirsiyareke ecêb ji min dikî" ji bavê min ra got,-Hovhannêsê feqîr kalemêre, temenê wî yê devedevî heyîştê salane, wê ji kî derê hêz û hereketê bîne, destxe, ku kevirên giran hilgire û dîwaran dayîne? Eva devedevî deh-panizdeh salane dest ji wî pêşê xwe û ji kar û baran kişandiye.

-Tu rind haj pê heyî?-bavê min, ku qet nedixwest ji vê gotina Şîralî bawer bike, eşkere xemgîn bû û jê pirsî.

-Çawa haj pê tune me, bavo, -Şîralî bersiva wî da, -ez û Hosta Hovhannês cînarên hevin, navbera malên me da riya nîv kîlomêtrê jî tune. Her bi tenê ez li taxa Sipîtakê ya nû dimînim, ku bajare, lê ew jî ya kevin da, ku Humamliya eslî bû û weke gund maye. Te tirê dîsa ew Hovhannêsê berêye. Na, êdî kalbûnê lê kar kiriye.

-Min ji te ra negot?-Şalîko xwe nav giliya ra kir.

Ev gotina Şalîko jî li bavê min xweş nehat, ewî ser wê pirsiyarê bêtir mirûzê xwe kir.

Piştî Şalîko îcar Şîralî ji bavê min ra got:

-Bavo, tu çima behsa Hosta Hovhannês dikî?

-Çimkî ez dixwazim Hovhannês dîwarê havîngeha Şalîko û Wezîrê min dayîne, -bavê min kurt û kese bersiva wî da.

-Na, bavo, -Şîralî bi awakî hêsa, rehet ji bavê ra got, çimkî haj hevpeyîvîna wî, Ezîz û Şalîko ya bi awayê hişk û sert tune bû, -terka Hovhannêsê kalemêr û feqîr bide, ew êdî ne yê wî karê giran–dîwardanînê ye.

-Ezik bêm, bêjimê,-bavê min, ku eşkere ser vê gotina Şîralî feqîr bû, got, - naqewime Hovhannês giliyê min erdêxe, "Na, na"bike.

-Bavo, -Şîralî gotê, -axir tu dibêjî, ser gotina xwe da dikevî, lê meriv hew tirê haj pê nînî, ku çiqas sal, zemanekî çiqas dirêj ji hêna hevaltiya te û wî, danîna dîwarê odên te derbaz bûne: weke nîv sedsalê. Em kalbûnê jî alîkî dayînin, lê nava zemanê haqas dirêj da betsarî dikeve navbera du birên temê de û bavê jî, gava ew hev nabînin, ji hev dûr dimînin, êdî li ku ma ya du hogiran ,-Şîralî xwest bavê bide bawerkirinê, ku boyî xatirê wî jî Hosta Hovhannês xwe nade ber danîna dîwarên havîngeha lawên wî.

-Şîralî, -bavê min piştî van gotinên wî bi awakî eşkere aciz bû, got, -eger dema dîtina min Hovhannês weke birê temê dê û bavê xwe neavêje pêsîra min û ji şabûna dîtina min kela girî nede qirika wî-ezê vê simêla xwe,-bi vê gotinê ra bavê min dest avêt ferqeke simêla xwe, ew kire navbera tiliyên xwe, çend cara kaş kir û got,-ji ber da kurkim.

-Belkî jî, bavo, -Şîralî ji ber vê acizbûna bavê xwe milahîmtir peyîvî,- lê ku boyî xatirê te piştî deh-panizdeh salên terkdana hostatiyê bê û vî temenê mezin da, navbera van çiyayên Pampê yê bilind da, li cî warê hewa sert û bona saxiya kalemêran ziyandar dîwarê avayê kurên te dayîne, min ji vê yekê qet bawer nekir. Ez îcar îzbateke vê gotina xwe yeke dinê jî bêjim. Salekê berê, gava min weke niha tivdîra çêkirina avayîkî, havîngehekê ji bona xwe û neferên xwe li vî gundê me didît, weke hercar Hosta Hovhannês hate mala min ya li Sipîtakê bi mêvanî. Carina jî, gava ji sehet, ji saxiya xwe aciz bûya–wek doxtir dihate bal min, ku ez çarekê nexweşiya wî ra bibînim, ku bi giranî ya kaltiyê û hinekî jî-vexwarina şerav û araqê bû. Erê, gava ew vê carê hat-min jê ra derheqa vê tivdîra xwe da got, lê qet jî ne ji boyî wê yekê, ku ew dîwarê avayê min dayîne. Ewî jî zanibû, ku ez ji bona wê yekê tivdîra xwe bi wî naxim, lê dîsa jî xîreta wî temûl nekir û ji nişke va herdu destên xwe li çokên xwe xist û got:

-Heyîf, hezar cara heyîf, ku ez êdî ne Hovhannêsê berê me, yanê na, minê kurê birê xweyî Eşo ra şaneşîneke wisa bineqişande, ku dinê-alem lê bihata sêrê, meriya bi tiliya ew nîşanî hev dana. Lê kalbûnê ez danîm.

-Hosta Hovhannês, -ez ber dilê wî da hatim,-min qet jî ne ji bona wê yekê tivdîra xwe bi te nexist, ku tu bêyî wî avayê min çêkî û ez bibim sebebê vê acizbûna te. Ez baş zanim, ku tu zû va dîwara danayînî. Min weke mezinê xwe ev gilî ber te vekir, ku tu her bi tenê haj ra û tivdîrê min hebî. Niha hostên danîna dîwara pir bûne, raste, ne hostên weke te pisporin, lê dîsa jî dikarin wî karî pêk bînin.

A dibînî, bavo,-Şîralî awa û awazê axaftina xwe guhêrî û got,-eger pirî-hindikî bikaribûya wê dest ber

çêkirina avayê min ra bibra, çimkî ez bilî ku lawê kiriv û hogirê wî me–her wa doxtirê wî me jî, bi kêrî wî têm û ji bona saxî û silametiya xwe jî mabûya wê hewil bida xwe qencîkê ji min ra bike.

-Şîralî, ez bi qurban,-bavê min, ku bîntengî hinekî jê revî, kur ra got. -Bi gotina te ji bona doxtirbûnê te Hovhannêsê berî hemûşka avayê te çêkira, lê eger dest ber çêkirina yê te ra nebiriye, usane, yê me qet û qet çê nake, erê?

-Bawer bikî usane, bavo, -bi awayê ber dilê bavê da bê Şîralî jê ra got,-diniya niha hatiye ser menfeetê, lê gorî menfeeta şexsî, ji bona saxî û silametiya xwe jî mabûya Hosta Hovhannêsê beriya hemûşkî avayê min çêkira, lê ne yê te.

-Lao, -bavê min ev peyîvika"lao"bi awazekî wisa got wek bêje: "Ji Xwedê bitirse, tiştê wisa nebêje, giliyê wisa neyîne ser pêşa me", -berê me bi menfeetê hev nas nedikir, me bi merivtayî, ji dil hevaltî, dostanî bi hev ra dikir. Tu dibêjî, lê qet texmîn jî nakî, ku giliyê te hevdu nagirin.

-Çawa, bavo?-Şîralî metelmayî jê pirsî.

-Te hema hêja got, ku Hosta Hovhannês ji min ra got: "Hezar carî heyîf, ku ez ne Hovhannêsê berê me, yanê na, minê ji kurê birê xwe Eşo ra şaneşînekî wisa bineqişanda, ku dinê-alem lê bihata sêrê, meriva bi tiliya ew nîşanî hev dana". -Erê, min hema wisa jî got, îcar?-Şîralî, bê ku femkirina nêta bavê ya weke mîsal anîna gotina Hosta Hovhannês li nav peyîva xwe, jê pirsî.

-Ez jî hema wê yekê dixwazim bêjim, lao,-bavê min ser gotin û pirsiyarkirina Şîralî da anî û axaftina xwe berdewam kir:-Eger Hovhannês weke merivên vê dewrê bûya, wek tu dibêjî, miriyê menfeeta xwe bûya, bi rastî menfeetçî bûya, wê bigota: "Minê ji boyî doxtirê xwe yê hêja şaneşîneke wisa çêkira, ku xelkê pê tiliya nîşanî hev dana". Lê şûna wê, weke te bîr anî, ewî gotiye: "Minê ji kurê birê xweyî Eşo ra avaykî wisa çêkira....." û pişt ra gotina xwe temam bikira. Dibînî, lao, ez pesinê xwe nadim, lê dîsa jî hûn gotî qebûl bikin, ku Hovhannês we û bi pê ra jî te bi min, bi serî min nas dike, berî hemûşkî te kurê birê xwe dihesibîne-piştra hêja–doxtir. Loma jî xwe weke kurê birê xwe berpirsiyarê te dihesibîne, lê ne ku weke doxtir. Her çiqasî jî bavê min got, ku pesinê xwe nade, lê bi rastî em wê demê bi pesinandina xwe ya eşkere û bi awakî hişk metelmayî kirin. Cara yekemîn me ji zarê wî bihîst, ku ew xwe di serfêza me da dihesibîne, çiqasî jî ew heqîke eşkere bû. Hetanî wê demê bavê min her bi tenê bi me firnax dibû, bi me serbilind dibû, xwe ji me ra, weke dibêjin, dikir erd û xwelî. Û eger pesin jî dida, lê ew jî her bi tenê yê bavê xwe yê rehmetî. Min jiyana xwe da bilî wî tu kesekî dinê nedît, ku bavê xwe haqasî pir nava civakê, şîn û şayan da bîr bîne, bipesine, bi navê wî kêfxweş û serbilind be. Ez pişt ra jî ser wê yekê da kûr û dûr fikirîm, kanê çima wê rojê, wê demê bavê min her wa pesinê xwe dida, her wa şexsê xwe serfêza yê me da dadanî. Ewî, weke min fem kir, her bi tenê ji boyî wê yekê pesinê xwe

dida, ku bi wî awayî jî me bibe ser tayê xwe û ku em destûra wî bidin, ku ew ji bona çêkirina havîngehê ne tu kesekî dinê, lê her bi tenê Hovhannês vexwîne. Gava Hosta Hovhannês hat ewî jî pesindana xwe ji bîr kir. Piştî vê gotina bavê min, weke dibêjin, demekê lalome kete devê Şîralî, ewî nizanibû bi çi awayî bersiva bavê bide, loma jî her bi tenê gote wî:

-Bavo, hilbet, em heta îro jî bi te, bi navê te û yê kalikê minî Hûtî têne naskirinê. Lê qet girêdana vê yekê bi rewşa Hosta Hovhannês ya niha ra tunene, wê rewşê ra, gava ew êdî nikare dîwara dayîne, çiqasî jî ji te hiz bike, rûmeta te bilind biparêze. Yekê jî, niha wek zemanê berê nîne, gava gundê me da te nikaribû merivek, mêrekî wisa peyîda bikira, ku holik çiye, dîwarê holikekê nikaribû daniya. Niha gele hosta gundê me da peyîda bûne, ewên diçin axa xam û xopan û ji wan ra dibêjin:xopançî. Çima wana hosta Hovhannês xirabtir dîwarê havîngeha Ezîz danîne? Gava ez jî sibe-dusibe ji xwe û neferên mala xwe ra havîngehekê çêkim, ezê kevira û mesela, matêriyal, mesele, madeyên dinê bînim bidim ber destê xopançiyan û pişta xwe bidimê-herim; êdî mesref û cefayê çêkirina xwerina hostan jî nabînim, çimkî mal, tendûr-koçkên wan di gund da nin.

-Ez qurbana te û wî devê te me, Şîralî, -gava Şîralî wa got kêfa Ezîz xweş bû û wî got,-min jî gava dinê, berî hatina te hema ew yek bavê xwe ra got, lê ew aciz bû.

-Na, bavo,-Şîralî bi awazekî wisa ji bavê ra got weke êdî ev pirsa hilbijartina hostan bi serkeftina mebiran hel bûbe,-qet jî aciz mebe, Ezîz rast dibêje.

-Lao, weke ez dibînim, hûn herçar bira berî niha li hev rûniştine, we biriyar daniye dijî xwestina min derkevin, -bavê min bi awakî pir xemgînî, melûl û merivekî şikestî gote me.

-Bavo,-Şîralî ev şikestin û melûlbûna wî texmîn kir û jê ra got,- me berî niha çi zanibû, ku tê ji nişkê va hostê xwe yê berî çil-pêncî sala bîr bînî, lingê xwe bixî saleke teng û dewê bikî, ku her bi tenê ew ji te û kurê te ra avayî çêke. Ez dibînim, tu gelekî diêşî û xemgîn dibî. Eger baweriya te bi min û Ezîz nayêhere, xwe biceribîne...

Bavê min xwe ker kir, bersiva Şîralî neda û rabû-çû mala Ezîz.

-Te çima jê ra wisa got?-Piştî çûyîna bavê min Ezîz dew û pirsiyar ji Şîralî kir,-me bi zorê ew anî bû ser tayê xwe û te jî dîsa riya çûyîna Sipîtakê ber wî xist.

-Ezîz, -Şîralî berê xwe da birê mezin,-çima te nedît-çiqasî melûl û xemgîn bû, hew mabû bigiriya. Gunê min pê hat-loma min wa jê ra got. Eger diçe jî bera here. Hê baş nîne, ku bi guhê xwe ji devê Hosta Hovhannês bibihê, ku ew hew dîwara datîne, zû va dest ji wî karî berdaye. Yekê jî, bera bîna wan ji hev derkeve, hizreta dîtina hev ji dilê xwe derxin, çimkî Hosta ji wî bêtir heyîra wî dane. Te nebihîst, min mexsûs ser ra xarand û gotê, ku her kes menfeeta xwe digere, ku loma jî, eger Hosta Hovhannês bikaribûya wê xwe bida ber çêkirina havîngeha min weke doxtirê xwe, weke

doxtirê, ku bi kêrî wî tê. Lê eger dixwazî rastiyê bizanibî, ew min bêtir weke kurê Eşo qebûl û nas dike, lê ne ku weke doxtir. Çiqasî jî pir salin ewî bavê min hev ne dîtine, lê gava ez û wî hev dibînin ew ji min ra, weke bineciyên Sipîtakê yên dinê nabêje : "Doxtir"yanê jî "Hevalê Raşîdov", lê bêtir min bi nav dike: "Kurê birê min ". Wisane, bavê min haqas dilê wî da kûr rûniştiye, nîgara bavê min di çavên wî da haqas geş mor bûye, ku zemanê dirêj nikaribûye ewê betreng bike. Min mexsûs ev yek jê ra got, ku ser anîna Hostê bêtir germ nebe. Ez pir caran û di nava qewil û şertên cuda-cuda da pê hisiyame, ku Hosta Hovhannês bavê min bi rastî wek birê xwe dihesibîne. Piştî pir salan navê bavê min ne ku weke nasê xwe, ne ku weke hogir yanê jî kirîvê xwe, lê bi tenê wek yê birê xwe tîne ser zimên. Hertim, dema her rasthatineke me pirsiyara bavê min, Elo û meta min dike, pîrka mine Xem û dayîka mine Karê bîr tîne. Bi awakî dûr û dirêj bîranînên xwe ji min ra derheqa wan da dibêje, derheqa wê yekê da, kanê dema çêkirina avayê me yê berê çi bûyerên balkêş û întêrêsant mala me û gundê me da çê bûne, girêdan û pêwendiyên wan bi hev ra çawa, bi çi awayî bûne. Û dema hatina bal min ese vê temiyê li min dike, ji min ra dibêje: "Kurê birê min, eger Eşo van aliyan da tê ese min guhbihîstî bike yanê jî ewî, kerema xwe, hilde-bîne mala me. Ezê hetanî ber derê Xwedê ji te razî bim". Ji bavê min eynî weke birê xwe yê biçûk hez dike.

Dema vê axaftina Ezîz û Şîralî ez hêdî-hêdî dêrî bûm û ketim nava xiyal û mitalan û ez bêtir ser wê yekê da fikirîm, kanê sebebê wê yekê yê bingehîn çiye, ku bavê min haqasî înkê sekiniye, haqasî dixwaze Hosta Hovhannês bibîne û nemaze bi destî wî havîngeha min û Şalîko bide avakirinê. Û ez, awa, hatim ser çi fikir û encamê. Min hêja zelaltir texmîn kir, ku sebebê bi destî Hosta Hovhannês çêkirina havîngeha me herdû biran ne heqasî ewe, ku ewî ji bavê min ra bi rastî odên weke qutî, sandoqên pola çê kiribûn û ne jî heqas ew bû, ku bavê min îtibara xwe bi xopançiyên gundê me ne dianî, lê, awa, sebebê wê yekê yê bingehîn çi bû. Wî dixwest bi anîna Hosta Hovhannês bal xwe-gund ji nû va xwe û jiyana xwe ya berê bibîne û, ya here mûhîm, hogirekî xwe, yê, weke pişt ra zelaltir kifş bû, yê amin û helal, bikaribe hizreta xwe bi serî wî hindava rojên jiyana xwe ya buhurî ya şexsê xwe da bistîne, bişkêne. Derdê wî ne heqas hostatiya xalê Hovhannês bû, lê çiqas hevdîtina wî û xwe bû. Şîralî, piştî ku pê hesiya, kanê wê rojê şofêran çi anîne, vegeriya Sipîtakê. Ez, Ezîz, bavê min û Şalîko li gund man.

* * *

Roja dinê sibê zû, gava em derketibûn der va, me bala xwe dida kevir, mesele û maddeyên çêkirina havîngehê bavê min ji nişkê va min, Ezîz û Şalîko ra got:

-Ez çûm Humamliyê.

-Çima?-Me metelmayî jê pirsî, ber ku hem ew biriyar û gotina wî ya nişkê va

bû, him jî bi rastî jî nizanibû, kanê çima û diçe mala kê:ya kurê xwe yanê ya Hosta Hovhannês.

-Ez diçim peyî Hovhannês,-ewî kese û kurt bersiva me da.

-Bavo,-vê carê jî Ezîz kete pêsîra wî û gotê,-ne axir Şîralî duh ji te ra got, ku Hosta Hovhannês zû va dîwaran danayîne, wekî loma jî, tu xwe badilhewa arzan nekî, lê tu jî, weke kifş bû, bi wî ra qayîl bûyî, lê niha çi li te dest da...

Ezîz hê peyîva xwe temam nekiribû, gava bavê min bi awakî sert jê ra got:

-Ez qet jî bi wî ra hev rûneniştim, min Şîralî ra tu tişt negot.

-Erê, ez jî zanim, te tu tişt negot,-Ezîz gotê, lê te xwe ker kir. Ez jî dilê xwe da fikirîm, ku tu hatî ser tayê wî, lê tu niha ji nişkê va dibêjî: "Ez diçim peyî Hovhannês!".

-Ez ji nişkê va nabêjim,-bavê min ber gotina Ezîz da hat,-lê xeber û biriyara xwe ya berê dubare dikim.

-Bavo, -Ezîz pêsîra wî berneda,-te çima lingê xwe kiriye soleke teng û ser ya xwe da ketî, hutê-mitê dibêjî, ku diçî dû Hovhannês. Ez zanim, ku tê badilhewa wê riya dûr, heqas erd herî.

-Bera badilhewa be, -bavê min bersiveke kurt da gotina Ezîz. Me kir nekir, em çiqasî pê da ketin me çare bi wî nekir, me nikaribû ew serwext kira.

Û ew rê ket-çû.

Bavê min merivekî rûnerm bû, qedir, rûmeta himberê xwe baş zanibû û hewil dida xwe, ku wana aciz neke, bi wan ra ser pirs û pirsgirêkên here giran jî bi hev rûdinişt, ya wan dikir. Lê carina ser ya xwe da diket û diniya hemûşk rabûya-nikaribû ew ji biriyara wî şûn da bida sekinandinê. Me ev yek zanibû û loma jî, gava dît ewî biriyara dawî daniye, em êdî pir pê da neketin, me dest ji pêsîra wî berda.

* * *

Bavê min çû. Sivetirê, gava tav şîrin bibû-me hew bala xwe dayê Şîralî bi avtomobîlekê hat û gava ser riya, ku nava gund ra derbas dibe, jê peya bû, dageriya ser şiveriya, ku tê ser mala me, Şalîko hêdî, weke xwe xwa ji xwe bipirse, ber xwe da got: "Lê kanê bavê min?". Şîralî hat gihîşt bal me, sivexêrî da û vê carê eynî pirsiyar Ezîz bi dengekî bilind ji Şîralî kir:

-Lê ka bavê min, Şîralî?

-Bavî çi, Ezîz?-Şîralî jî yalê xwe da pirsiyar ji Ezîz kir.

-Bavê min duh hela berî nîvro hat Humamliyê,-Ezîz gotina xwe hê temam nekiribû, gava reng û rûyê Şîralî xeyirî, ew sipîçolekî bû. Ewî bi zorê tûka xwe daqurtand û got:

-Bavê min nehatiye mala min, çi lê dest da?

Ezîz hêja texmîn kir, ku Şîralî tirsiya, ber ku wê demê Hosta Hovhannês nehate bîra wî û loma jî wî hew tirê bav riya mala wî ji bona dîtina neviyan daye ber xwe û rê va qeziyakê lê dest daye û loma jî negihîştiye malê. A ber vê yekê jî Ezîz lezand şaşiya xwe rast bike, ku Şîralî zêde netirse:

-Şîralî, netirse, bavê min ji me re got, ku diçe dû Hosta Hovhannês, wisane, çûye mala wî.

-De wisa bêje, malavayo,-weke ruh

nû ber Şîralî da bê ewî bi cûrê gazina ji birê xwe yê mezin ra got,-te ziravê min qetand, min jî dilê xwe da got: "Xwedê, bavê min duh va berbi mala min rê ketiye, lê rê va çi lê dest daye, ku negihîştiye mala min.

-Çima ji te re jî negot, ku dixwaze bona çêkirina havîngehê Hosta Hovhannês bûne,-Ezîz bi awayê pirsiyarkirinê ji Şîralî ra got.

-Ê gotibû,-Şîralî bersiva wî da,-lê me êdî, weke dibêjin, derê xana dada bû: em, bawer bikî, li hev rûniştin, ku ew terka Hosta Hovhannês bide, ewî jî xwe ker kir û min ew yek weke qayîlbûna bi min ra qebûl kir. Min feqîrê Xwedê ji kû bizanibûya, ku bavê minê ji nişkê va biriyarê dayîne, ku here dû dostê xwe ji bona danîna dîwara. Her bi tenê ew fikir di mêjiyê min da çê bû, ku ew hatiye mala min nemaze ji bona dîtina neviyên xwe û gava ji duh va negihîştiye ciyê-cî, wisane, Xwedê nekirî, rê va qeziyekê lê dest daye.

-Ê, bira,-Ezîz ji Şîralî ra got, -çima tu xamî, tu xeyîsetê bavê xwe nizanî, ku gava ew meremekî dide ber xwe, tivdîrekê dibîne–dinê-alem ber biriyara wî raweste nikare çarê bi wî bike, zora wî bibe, ewê, îllakî, gotina xwe bike, biriyara xwe bîne serî.

-De baş bû te ji min ra got, ku ew çûye peyî Hosta Hovhannês,-Şîraliyê, ku dilê wî bi vê gotina Ezîz baristan, rehet bibû, ji birê re got.

-Îcar, ew duh va mala Hosta Hovhannês da çi bêşeye, çi karî dike, eger ne hatiye mala te û ne jî ziviriye gund?-vê carê min pirsiyar ji Şîralî kir.

-Weyî, mala te ava be,- Şîralî bi beşer û mêzekirinek wisa bersiva min da, ku teyê qeyî bigota wê demê ew ser dûrayê wan herdûyan jî bal hev dibîne,-çawa çi dike? Ez baş haj xeyîsetê Hosta Hovhannês heme. Ew bi çirayê û lempê li merivên weke bavê min, merivên bi dilê xwe, hizkiriyê xwe digere, ku bigire û bernede; bi xwe ra dora sivra xwarin-vexwarinê bide rûniştandinê û heta şev dereng pê fîncanê araq û şerabê noşa, salixiya vexwe, kêf bike. Piştî pir sala cara pêşîn dostê xwe yê kevin, nêzîk û hizkirî dibîne, êdî wê çawa zû dest ji pêsîra wî berde. Ez rind dizanim, ku hetanî şev dereng ewana mutulgên araqê û şerabê dû hev vala kirine. Wê sivetirê jî rabin, paxmêliya(2) xwe bişkênin, taştiya xwe bixun, heta vira da, hetanî wê da nîvro wê ser wan da bê. Û hêja, ew jî bi ricakirina bavê min, Hosta Hovhannêsê destûra çûyîna bavê min bide. A piştî sehetekê-dudiya,- Şîralî li seheta ser destê xwe mêze kir, -bavê minê hêja bê. Belkî piştî mala Hosta Hovhannês ser riya xwe here mala min, neviyên xwe bibîne û hêja bê.

Ev peyîv hê di devê Şîralî da bûn, gava avtomobîleke barkêş ji jêla hat û li qoşî mala me ser dûraya pêncî-şêst mêran rawestiya. Du mêr ji kabîna şofêr peya bûn û xwe li me girtin-hatin. Me hemûşka, hilbet, ji dûr va dest xwe da bavê xwe nas kir, lê, weke pişt ra kifş bû, bilî Şîralî ewê bi wî ra nas nekir. Ji nişkê va bû carîna Şîralî û ewî bi dengekî hêle û bi awakî metelmayînê got:

-Pî, lê anî!

-Kî, kî anî?-bawer bikî me bira bi hev ra, bi awakî spontan ji Şîralî pirsî.

-Êdî wê kê bîne xên ji Hosta Hovhannês?

-Şîralî bi awayê pirsiyarkirinê ji me ra got.

-Rast dibêjî?-min jê pirsî.

-Lê xwe ez we naxapînim, çima ez Hosta Hovhannês nas nakim,-Şîralî bersiva min da.

Belê, sebebê nenaskirina Hosta Hovhannês ji aliyê min, Ezîz û Şalîko da û naskirina wî ji aliyê Şîralî da, hilbet, hebû. Piştî avakirina odên me nîveka salên 30î Ezîzê birê min belkî çend cara Hosta Hovhannês dîtibû, lê ew jî zû va, gele sala berê, loma jî ji dûr va nikaribû ew nas bikira; bejin û bal, reng û rûyê wî, wergirtin, fesal û awayê meşiyana wî ya niha û ya, em bêjin, bîst salan berê ne mûmkûn bû, ku weke hev bin.

Lê min Hosta Hovhannês jiyana xwe da nedîtibû û ber vê yekê jî nikaribû ne ji dûr va ew nas bikira û ne jî ji nêzîk va. Gava ewî bi apê xweyî Mampirê ra odên me çê kiribûn ez hê dergûşê ber hembêza dayîka xwe bûme, minê ji kîderê ew nas bikira û bi ser da jî dûr va. Rast e, riya neferên mala me pir li Humamliyê, Sipîtakê diket demên çûyîna me ya ji gund berbi Tivlîsê û yê dagera ji wir, lê çimkî mala Hosta Hovhannês li Humamliya berê ne li ser riya stasiyona tirênê, weke me digot, ya maşîna riya hesinî bû, bi ser da jî êpece dûrî wê bû, loma jî, gava em ji gund diçûn wir, ku ji wira jî herin Tivlîsê, qonaxa me ya dayîmî mala dostekî me yê dinê-Tatanans Avêtîk bû, çimkî mala wî li ser riya statsiyonê û nêzîktirî wê bû. Bona rê da tarî li me nekeve erdê em hê roj ronî bû ji gundê me bi piya, çiya ra, gêdûka Sipîtakê ra dihatin digîhîştin Humamliyê, lê çimkî tirêna, ku ji Yêrêvanê dihat û diçû Tivlîsê nîvê şevê dihîgîşt Humamliyê–em gotî hetanî hingê di maleke dostan da, weke hemû bineciyên yalê me-Axbaranê nasên xwe yên li wir bi nav dikirin, bi cî bûna, ku piştî bi cîanîna riya dûr em û nemaze zaro hinekî rehet, hêsa bûna hetanî zemanê hatin û çûyîna tirênê pê ra digîhîşt. Sehetekê beriya hatina tirênê em hêja ji mala dostê xwe yê dilsoz–Tatanans Avêtîk berbi stasiyonê rê diketin.

A ji ber vê yekê bû, ku piştî çêbûna odên me piraniya neferên mala me, bilî bavê min, Ezîz û Şîralî êdî Hosta Hovhannês rû bi rû nedîtibûn û loma bi xiyalî jî nikaribûn ew bîr baniyana. Lê eva qet jî nedihat wê menê, ku me ew bi temamî jibîr kiribû. Pir caran navê wî di mala me de dihat ser zaran; bavê min, dayîka min, meta min Meyane û mêrê wê-Elo bi hisret, kovan û hizkirin Hosta Hovhannês û apê wî-Mampirê bîr dianîn, navê wan hildidan.

Em niha bên ser hatina bavê min û Hosta Hovhannês. Roja hatina wan rojeke buharê ya xweş bû: ezmanî çîk sayî bû, bakî sivik, hênikî xweş dihat, bi xwe ra bîna gul û gîhayê hewirdor, çiya û banî, mêrg û zeviyên kesk û sor û zer dianî û piştî dû-dûkêlka bajaran ya giran meribên weke min her wa dixwest wê hewa xweş hecamke ya ku pişikên meriv wisa dadigirt, tij dikir, ku te hew tirê per û bask bi te va şîn

bin hew tenê bese tu hêzê bidî xwe, ji ciyê we quloz bî-tê weke teyîredevî hewa kevî, bifirî ber perên ezmanan. Weke ji dûr va xuya dikir, kêfa bavê min û Hosta Hovhannês eyîn weke wê hewê û gorî wê xweş bû. Ewana kîpî hev, mil dabûn milê hev gav didan, dimeşiyan ber ku riya mala me, ku ji riya nava gund ya berfireh vediqetiya, weke şiverê teng bû, navbera zeviyên keskîn ra derbas dibû. Bavê min wê demê gorî temenê xwe û rêvaçûna xwe ya hergav çapik û çelengtir dimeşiya, te hew digot di rojekê da bi çend salan ciwan bûye. Bi hev ra xweş dipeyîvîn û dikeniyan, lê çimkî hê ji me dûr bûn û ba jî pê ra, himber va li wan dixist, dengê wan bi navbirî bi me tesele dibûn û loma jî me jev dernedixist, em ser va nediçûn kanê ew çi peyîvan tînin ser zarê xwe, û çi ji hev ra dibêjin. Lê gava ranêzikayî bi me ra kirin-peyîvandina xwe dan birîn û bala xwe tam kişandin ser me. Û gava lap nêzîkî me bûn–bavê min çavên xwe li ser me hemûşkan gerandin, weke ji me re bêje: "Lê we digot Hosta Hovhannês, dinê xirab be, nayê, dîwaran danayîne, we îcar dît bavê we çawa ew bi qedir-rûmeta xwe anî!". Gotina bi vî awayî xeyîset, karaktêrê bavê min da bû. Ewî bi rastî ji quretiyê hiz nedikir, lê carina quretiya wek ya zarokan dikir. Rasttir, çawa dilê xwe da difikirî her wisa jî ew yek bi rû va eşkere dikir, weke hinekên dinê hestên xwe mexsûs venedişart. Eynî weke zarokeke dilpaqij pesinê xwe dida, lê ne ku quretî li me û xelkê dikir.

Dema nêzîkî me bûn min rind bala xwe da wan: ji sêrî hetanî lingan. Ewana, weke kifş dibû, hema hêja sûretê xwe dabûn kurkirinê, porê serê xwe dabûn çêkirinê, ber ku bîna odêkolonê û pûdrayê tevî bîna bayê buharê dibû û ew weke bîneke xweştir ber pozê me diket. Ya Hosta Hovhannês nizanim, lê ya bavê min nava çendik û çend salên dawî da min ew, bawer bikî, qet carekê jî heqas beşerxweş, ruhsivik, pêsivik, bi meşiyana heqas çapik û çeleng nedîtibû. Te qey digot wê rojê ew bibû zilamekî pêncî-şêst sal berê. Reng û rû, beşer, wergirtina herdûyan jî wê demê weke ya wan mêran bû, ku hema hêja destê govenda kurmanciyê ya giran berdane, govenda, ku min ji çûktiya xwe da dîtiye û ya ku ruhê bavê min di nav wê da bû. Mezinên me bîr dianîn, ku bavê min weke bavê xwe ji reqs, ji govendên kurmanciyê ji çûktiya xwe da hez kiriye, bi wî ra ketiye govendê, ber wî reqisiye.

Min û bi tecrûbeya min-Şîralî, Ezîz û Şalîko jî sebebê vê eşq û şabûna dilê herdû kalemêran zanibû, lê zûtirekê ew sebeb ji me ra zelaltir bû.

Gava ranêzikayî bi me ra kirin herdûyan bi hev ra, bavê min-bi kurdî, lê Hosta Hovhannês bi ermenî bi kêfxweşî û beşereke xweş silav li me kirin.

Û me jî bi kêfxweşî û bi devbikenî silava wan bi peyîva xweş û bi rêzgirtina ber temenê wan yê mezin vegirt.

Hosta Hovhannês êdî firsend, derfet neda me, ku em hal û kêfê wan bipirsin, pirs û pirsiyaran ji herdûyan bikin û şûna me ewî pirs û pirsiyar ji me kirin.

-Eşo,-ew ser milê xwe zivirî yalê bavê

min û gotê,-ez doxtirê xwe yê hizkirî, Şîralî hemîn baş nas dikim, evê hanê, -ewî bi destnîşankirin berê xw da Ezîz, -weke tê bîra min–Ezîz e. Herdû mêrên dinê duruf û çakûçê malbata wene, lê çimkî min ewana temenê wan yê herî biçûk, zarotî, tifaliya wan da dîtine, ezê bi texmînkirin bêjim, kanê kî ji wan Şalîko ye û kî jî Wezîr. Weke tê bîra min, Şalîko ji Wezîr mezintir bû, gava me odên we çê dikirin-ew bêminet dimeşiya, lê Wezîr–ber hembêza Karê bû. Lê vî temenê wan da, gava ferq, cudatiya temenê wan hindike- ji min re dijware ez kifş bikim kanê kî ji wan Şalîko ye û kî jî Wezîre...

Belkî Hosta Hovhannês bi texmîn, bi tecrûbekirin em herdû bira ji hev cuda bikirana, lê bavê min pêşiya wî ket û bi destnîşankirin jê ra got, ku ew êdî zehemtê nekişîne.

-Hovhannês, evê hanê Şalîkoyê mine, lê eva jî Wezîrê mine.

Hosta Hovhannês bi şabûn destê xwe da destê me û gote bavê min:

-Xwedê piştovanê wan be, mirazê te bi wan û zarên wan–neviyên te bike, lê qeziya û bextewar bijîn.

-Mirazê te jî bi law û keçên te, bi zarên wan bibe, Hovhannês, kedera wan nebînî,-bavê min jî ev dûa û dirozgeh bi neferên hogirê xwe kirin. Min vê carê ji nêzîk va bala xwe da herdû kalemêran û tim-tel, wergirtina wan. Cil û berg, ber û berstûyên herdûyan jî xweşik û paqij bûn. Ewana ew cil û berg wergirtibûn yên ku kalemêrên weke wan, bawer bikî, her bi tenê şîn û şayan da li xwe dikin. Gava xort, zilam û hetanî mêrên ciwan jî cil û bergên teze, xweşik û paqij werdigirin-eva weke tiştekî tabîî, xwezayî kifş dibe û qet jî ne yê metelmayînê. Lê gava kalemêr cil û bergên xweşik û paqij werdigirin-eva yeka wek tiştekî degme û, bawer bikî îstîsna kifş dibe, çimkî merivên bi temenê mezin, eger cil û bergên wan yên teze û xweşik hebin jî-kêfa wan êdî bi wan ra nayê, ewana hewas nakin û weke xwe ra jî nabînin wana hertim wergirin. Lê gav degme werdigirin ew cil û berg bêtir li wan tên, bêtir xweşik li ser bedena wan xanê dikin piştî wergirtina cil û bergên herroj û hergav yên xilmet û ne xweşik. Belkî vê hindavê da dereceke pisîkolojîk jî emel dike ya wisa, ku gava kalemêr û pîrejin cil û bergên teze, xweşik û paqij werdigirin kêfa merivan, nemaze ya ciwanan bêtir bi wan ra tê, ciwan bi wana ne ku bi tenê heyîr û hijmetkar dimînin, lê bi ser da jî bi wana şa dibin, eyînî weke merivên bi temenê mezin zarokên xweşik û zîrek ra kêfxweş dibin. Di vî warî da nayîvtî, xêfiktiya kalemêr û pîrejinan jî rola xwe dileyîze. Lê eva jî ji nêrînên kalemêr û pîrejinan yên kevin ser jiyana nû jî tê. Nifşên nû, ciwan hertim ji nifşên berê zîrektirin û ji ber vê zîrektiyê nêrînên kalemêran û pîrejinan weke yên nayîv, xêfiktiya dil di çavên ciwanan da kifş dibin. A hema bi wî awayî kêfa min û, weke min tecrûbe kir, ya birên min bi bejin û bala herdû kalemêran, wergirtina wan ya wê rojê ra hat.

Beriya me hemûşkan Şîralî ev nêrîn, ev hestên me eyan, eşkere kirin.

-Hûn herdû jî,-Şîralî vebeşirî û got,-dişibin xortên çardehsalî û meriv hew

tirê, ku hûn hema hêja ji şayîkê tên. -Em çima nabin xortê çardehsalî?- Hosta Hovhannês bersiva vê gotina Şîralî derengî nexist, bi kubarî û serbilindîke eşkere da, -gava me piştî zemanekî dirêj teze hev dît. Dîtina Eşoyê min ji min ra bi rastî jî şayîke mezine.

-Hosta Hovhannês, -Şîralî vê carê dêm, reng û rûyê xwe ciddî, sêriyoz kir û gorî wê jî deng û awazê axaftina xwe guhêrî-bi awakî wisa, ku teyê qeyî bigota wê rojê cara yekemîn dest bi peyşvandina xwe ya bi wî ra dike û bi qurpandina çavê xwe bi me biran ra, gotê, -çiqasî jî edetê me kurda da tune û ew yek weke tiştekî bi şerm û bêedebî tê hesibandinê, ku malxwê malê ji mêvan bipirse, kanê ewî çima, bi çi xizmetê, bi çi mexsedê qesta mala wî kiriye, hetanî mêvan bi xwe wê yekê eşkere neke, lê ezê vî edetî binpê bikim û ji te sewal bikim: -Hûn îro eşqa bavê min û kêfa dinê ra, bona ser û seyîranê hatine vira yan mexsedeke dinê hûn anîne?

Piştî vê pirsiyrara Şîralî dest xwe da reng û rûyê Hosta Hovhannês jî hate guhêrandinê û ne ku bi tenê weke yê Şîralî berbi ciddîbûnê, sêriyozbûnê, lê bi ser da jî reng û awazekî xemgîniyê wergirt. Weke zûtirekê eyan bû, Hosta Hovhannês, ku haj xwe, haj biriyardana xwe, weke dibêjin, haj fêla xwe hebû-dest xwe da ser va çû, kanê Şîralî bi çi va, bi çi sebebî û ji bona çi meremê wê pirsiyarê jê dike û beriya ku Şîralî nêt û meremê vê pirsiyarkirina xwe eşkeretir bike, weke emê pişt ra bibînin, dest bi xweparastinê, berxwedanê kir. Min jî û belkî birên min jî ev yek tecrûbe kirin, çimkî haj hemû bûyer û axaftinên berî hingê çêbûyî hebûn. Hosta Hovhannês hevsa xwe ji Şîralî dikir, baş zanibû, ku ew dikare û heqê wî jî heye gazinan ji wî bike, bi ser da jî jê bixeyîde, eger ew sebebê hatina xwe ya wê rojê ya li gundê me eşkere bike. Lê ezê, ku baştir haj xeyîsetê Şîralî hebûm, min nêta vê pirsiyarkirina wî dest xwe da fam kir. Eger Hosta Hovhannês nêta hatina xwe ya wê rojê eşkere bikira, ku beriya eşkerekirina ji yalê wî da jî êdî ji bona min û biran femdarî û eşkere bû, nemaze piştî wê yekê, gava Şîralî çavê xwe bi me ra qurpand, ewê gorî xeyîsetê xwe biketa kirê wî, wek dibêjin, bi ruhê wî ra bileyîsta weke bi yê zarokekê ra. Belê, Şîralî pir caran bi zanîna xeyîsetê merên bi temenê xwe ji wî mezintir û gorî wê xeyîsetê bi awakî perdekirî ew bi gotinên xwe didan êşandinê, zêrandinê, ku bi xwe jî dilê xwe da bi wan şa bibe bi karanîna dilpaqijî û xêfiktiya dilê wan yê weke yê zarokan. Belê, eynî weke merivên bi temenê mezin ji ber hizkirina zarokekê dikevin kirê wî, pê şa dibin, ber ku zarok henek û laqirdiyên wan şûna gotinên ciddî, sêriyoz qebûl dikin. Û weke pişt ra eyan bû, Şîralî haj xeyîsetê Hosta Hovhannês yê weke yê zarokekê hebû, loma jî ev firsend da bi karanînê, ku bikeve kirê wî, weke kurd dibêjin, xweşiyê xwe bi wî bike û, dîsa weke dibêjin, kurmê xwe yê bi cîanîna henek û laqirdiyan, hûmorê bişkêne. Şîralî û bi giştî hemû merivên weke wî yê xudanê hesta hûmorê, henek û laqirdiyan her bi tenê dikevin kirê wan merivan, bi ruhê wan kesan ra dilîzin ji kîjanan weke zarokekê hiz dikin.

Berdewam bibe.